

Newroz	Hejmar (81)	Rûpel (3)	Tebax	2008z – 2620k	
NÛÇE	Û	ÇALAKÎ	NÛÇE	Û	ÇALAKÎ

Birûsk

Ji Komîta Şevbuêrkên Kurdî li Şamê re

Xwişk û birayên hêja...

Rêz û silav:

Eve şeş sal di ser destpêka xebat û çalakiyên we re derbas bûne, bi armanca pêşxistin û bilindkirina ala ziman, wêje û folklorê kurdî, we li paytexta welêt, li Şamê, xebateke bi rêk û pêk û hêja kiriye, bi dehan berhemên bi zimanê kurdî di şevbuhêrkên we de hatine xwendin û gengeşekirin, evîna zimanê zikmakî li nik keç û xortên me cih girtiye.

Ev karê we, cihê şanaziya me ye, karekî welatparêzî ye, em piştgiriya we dikin, hêviya berdeyamî û serkeftinê ji we re dikin.

**Weşana NEWROZ
24.07.2008 Z- 2620 K**

Heval Ebdilcelîl Xelîl

Çû ber dilovaniya Xwedê

Roja Duşemê 11. 8. 2008, li Erebistana Siûdiyê, hevalê me yê giranbuhê **Ebdilcelîl Xelîl** (BAVÊ ARAS) koça xwe ya dawî ji nav me bar kir û çû ber dilovaniya yezdanê mezin û dilovan. Di roja 18. 8. 2008 an de, roja Duşema reş, cendekê wî yê sar î bê rewan, li goristana gundê **Nebîsadî** bû mêvan. Ji beşdariya

Dumahîk : Kamuran

Piştî axaftina wî, min herdem bi çavê bavê xwe li Mîr Kamuran dinêrî. Ji bo ku ez navê wî mezintir bikim û layêqî navê wî bim, min herdem xebatên xwe zêdeyî sînorê hêza xwe dikir. Îro jî şexsiyeta wî rêberiyê ji bo jiyana min dike. Ez bawer im sedema ku heta niha ez ji aliyê polîtîk û exlaqî ve li ser nîgan mame, paya hîsên netewî yê ku min ji Mîr Kamuran girtî ne pir mezin in.

Dema mirov bala xwe bide Evdirehman

cemawerê pir, hêzên welatparêz û nûnerên partî û rêxistinê, di hate zanîn ku heval Bavê Aras cihekî xwe yê bilind û taybet di dilan de girtibû. Nemir

Ebdilcelîl, di sala 1968 an de, li gundê **Nebîsadî**, herêma Dêrikê, ji dayik bûye. Raste ku çare li mirinê nabe, lê



belê mirina mirovekî xwedî bîr û baweriyên netewî weke heval Bavê Aras, nexasim li koçberiyê dûrî malbat, dost, heval û hogiran, gelekî giran û bi keser e. Her wekî ji gotina nûnerê partiya wî, Partiya Yekîtiyê a Demokrat a Kurd li Siûriy - YEKÎTÎ-, hate xuyakirin ku rûmeta xebatkaran cihê rêzgirtinê ye.

Bi navê weşana **NEWROZ**, bi dilên kovan û xemgîn, em bejna xwe li ber cendekê heval ditewînin û sersaxiyê ji malbat, dost û hevalên wî re dixwazin.

Herweha em sipasiyeke taybet ji revenda kurdî li siûdiyê re ji ber yekîtiyê hev girtina wan di bûyerên wisa de, hêviya pêşketin û serkeftinê ji wan dikin.

Aramî ji me tevan re, sersaxî ji malabata heval **Ebdilcelîl** re. û cihê wî buhiştê rengîn be!.

(Weşana **NEWROZ**)

Qasemlu û li ser şexsiyeta wî kur bibe, dê bê dîtî ku kaniya me yek e. Lê rewşa Evdirehman ji ya min erênîtir e. Ji ber ku mirinek bi şeref bû paya wî. Ji min re serbilindiyek mezin e ku, rojekî ez jî mîna wî ji bo gelê xwe şehîd bibim û ava şehadetê vexwim.

Ala ku Evdirehman Qasemlu bilind kiriye, îro jî di nava gelê wî de ye, her roj cihê xwe bilind dibe. Şerefa herî mezin jî ev e (Hatiralarm, Doz yay)...